# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993


Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
*Email :* Newroz95@hotmail.com

| Hejmar(67) | Nîsan | 2006 z~2618 k | Buha ( 15 ) p.s |
|---|---|---|---|


## Şerxwazî Pirsa Kurd Çareser nake

**B**ûyerên gerim û balkêş, yên ku li vê dawiyê li Turkiyê, Îran û sînorên Kurdistana Îraqê hatibûn holê, ciyê rawestina siyasetmedar, rojnemevan û dewletan bû.

Medya Turk, bi her awî diqîre û dike şemete: (( Haho, Îraq parçe dibe, Kurd li wir dibine dewlet, birayên me yên Turkmen li Kerkûkê ji dest hêzên Talbanî û Barzanî ne di tu halî de ne, ... Terorîstan li dijî cimhoriyeta Turkiyayê xwedî dikin....Û H.W.D.)) . Di siha piropagendeke weha de, bi dehezaran leşkerên Turkiyê berê top û tangan didine herêma Kurdistana federal, tevdîr û haziriyên hêrişênmezin dikin. Vêca di ber re jî, hêzên dewleta Îranê ji hêla xwe ve, dest bi hêrişan kirine, gelek gund û bajarokên Kurdistana federal bombebaran dikin. Baş dixuye ku, aştiya li Kurdistana Îraqê, li hevkirina herdu hêzên sereke, PDK û YNK, rêkeftin û gavavitina bi hêla yekirina herdu îdarên Hewlêr û Silêmaniyê bi seroktiya Nêçîrvan Barzanî û rêbertiya kak Mesûd, nûkirina seroktiya Mam Celal ji Îraqê re, li dirêjiya \ar salên dî, li ba karbidestên Anqerê û Tehranê ciyê xemgîniyeke mezin e. Lewre, çavsor dibin, bi dijayetî li hebûna pirsa Kurd dinêrin û loma berê xwe didine şer û xwînrijandinê.

Di çarçewa vê pêvajoyê de, ji bîra nebe ku, rola rijîma Be's li Sûriyê çendî ji rola Şranê re alîkar û piştgire û bi kêrî pir lîstikan tê .

**Sînorê Yekta**

## Reş û Sipî

**W**eke tê zanîn ku, gava



bivek bi ser welatekê ve tê, destlat bi her awî li xwe vedigere û têkliyên xwe bi milet û hêzên wê re xort deke, daku kanibe li hember wê bivê reaweste. Lê mixabin, deslata Sîriyê tersî vê zagonê diçe. Çiqas biv bi ser me de tên, ewqas har û bi hêrs dibe û detst dide ser hemwelatiyên xwe.

Di heyva Avdarê de, bi dehan rewşenbîr, welatparêz û partîzanan, mîna :- Nivîskar **M. Xanim** - **Elî Ebdela** û hedu kurên wî - **Semêr Neşar** û li vê dawiyê , xebatkar **Fatih Camûs jî , ew** hatine binçav kirin**.**

www.arsivakurdi.org

## li zanîngeha Helebê

*- **Li** 14 î Nîsana 2006an , rêxistina P.Y.D.Ks li zanîngeha Helebê, seyranek ji xwendekarên Kurd re li zanîngehê li darxist . Seyran bi hevpişkiya dora 2000 xort û keçên Kurd yên xwendekar û alîkariya gelek hunermendên hêja mîna Mehmûd Ezîz Şakêr, Osman Can, zekerî, Teyar, Newroz,



Havîn û koma zanîn…H.W.D, tevlêbûna xwendekarên Efrînê û beşdariya hin hevalên rêvebir ya partiya YEKÎTÎ li darket . Seyrana xwendekarî, li navça Efrînê, di hembêza ziravka xweşik û delal de, li nav dar û berên wê yên bi hemerengan xemlandî , bi silavnamake kurt ji bal P.Y.D.Ks destpêkir . Pişti re pirogram bi stranên folklorî jaliyê stiranbêjan ve, awazên xweşik û delal, çepik û lîliyan, reqis, sema û dîlanên curbecur cihê – cihê, bi kêf û xweşî hate domandin . Mirov dikare bibêje ku, seyran ta dawiya xwe, bi siruşta ziravkê, bi gul û çîçek, dar û ber, av, teyr û tilûrên wê re, bi şahî – weke tabloyek rengîn ku, bi destê hunermendekî navdayî cêbûye – bû yek.

Desteya weşana Newrozê hemî xwendekar û hunermendên di wê seyran û şahiyê de beşdar û alîkar bûne. Sipas dike û serkeftinê ji wan re dixwaze.

- **Komcivînên hevpişk**:

**Di** çarçewa têkliyên rêxistina P.Y.D.Ks , li zanîngeha Helebê de, bi partiyên bira re , rêxistina P.Y. D .Ks li zanîngehê û rêxistina P.D.Ks ( A di Hevbend e) , çend komcivînên hevpişk ji xwendekarên zanîngehê re, bi rêk û pêk li dar xistin. Ew komcivîn . li ba beşdaran , ciyê sûd û rêzgirtinê bûn.

### Rêxistina Reqê- Kobanî- Girêsipşî

**R**êxistina P.Y.D.Ks , li Reqê û Kobaniyê , di 21.4 2006an de , ji bo cejna rojnemevaniya Kurd , li kela Cehberê , ahengek xweş çêkir . Koma Buhar ya Kobaniyê , Reqê û Tilebyedê , bi stiran û reqs û semayên xwe ew şahiya xemilandin . Lê beşdaran jî bi beşdariya xwe , kela şênkirin . di şahiyê de , wêneyên Mîr Mîqda Midhet Bedirxan jî belav bûn , û gotina patiya me û ya Komelê jî hate xwendin .

### * Konfirasa zimanê Kurdî :

- Zimanhezên zimanê Kurd , li bajarê Helebê û bi beşdariya hin Nûnera ji herêma Cezîr û Efrînê , li 27 . 3 an , civatek fereh û zengîn bo parastin û fêrkirina zimanê dê , li dar xistin

www.arsivakurdi.org

## Nûçe û çalakî Nûçe û çalakî Nûçe û çalakî

### *Nweroza Laziqiyê*

*- Rikxirawa partiya me ( P.Y.D.Ks) tevle hin xwendekarên Kurd li wir û di gel hin hevalên T.K û bi alîkariya tîpa Perwer ya folklorî, hunermend Ciwan , Newroz, Şêrkan ji Efrînê û hunermend Husên Îbrahîm ji Dêrîkê , cejna xwe ya netewî NEWROZ vejandin.

Bi beşdariyek balkêş ji aliyê malbatên Kurd ve yên ku, li Lazîqiyê dijin – mirov dikare bibêje ku, hejmara beşdaran 700 kes derbaskir – şahiya cejna NEWROZê di sîng û hembêza siruşta rengîn de, bi kêf û xweşî hate borandin .

Şahiyê bi kêlîkek bêdeng, li ser giyana pakrewanên Kurdistanê , 12 î Avdarê û pakrewanê NEWROZê Silêman Adî destpêkir û piştre sirûda netewî û gotina NEWROZê hate xwendin .

Xwedekarên Kurd jî, bi pişkdariya xwe yên tekane ev bûyer zengîn kirin .Wan bi kêf û xweşî beşdar vegeriyan malên xwe, ji xwedê xwestin ku, NEWROZ di salên dî de jî, bi xêr û aştî di ser mer re derbas bibe.

### Du waneyên balkîş

- Komîta çandeyî ya P.Y..D.Ks li Laziqiyê di çarçewa pirograma xwe ya çandeyî de, di dawiya heyva Avdarê de, waneyek di bin navnîşan ( Kurd di sedsala 19an de ) li darxist . Wanevan di waneya xwe de, hemî bûyer û serpêhatiyên di vî sedsalî de qewimîne û bi taybetî jî şoreşên Kurdî anîne zimên .

Lê, hêja ye ji bîr nebe jî ku, rola beşdaran di zengînkirina waneyê de berçav bû. Li dawiyê sipaskirina wan ji wanevanê xwe re, li ser ked, zar û zimanê wî di ber amedekirina wê waneyê de ciyê rêzgirtinê bû.

*- Careke din, wê komîta çandeyî waneyek di bin navnîşana " Împeretoriya Midiya " de, pêşkêşkir. Waneger di waneye xwe de, dîroka Împeretariya Mîddiya ( destpêka avakirinê, şaristaniya wê û cîranan ) anî zimên . Zengînbûna waneyê bala beşdaran ber xwe kişand.

### Kurte Nûçe

*- Li gundê Curqa , çiyayê Bilêl , Raco , termê Husên Bekir kurê Umer , xortê 22 salî tê dîtin . Bê yî ku, bê zanîn , çawa û kê kuştiye . Xwedê sebrekê bide xwediyên wî .

*- Dîsa li gundê Curqa , li Reco , bav û kur û keça wî , bi destê cîranên xwe têne kuştin .

*- Li Kobaniyê jî , bavek( Hemê Şewket) herdu lawên xwe qurşîn dike . Di encam de, yek dimre û yek birîndar dibe .Ax nezaniyê tu bûye sedema rêtina çiqas xwîn û hê tê çiqasî dî jî birêjî.

### *Xebakar Hecî Heso jî barkir*



Xebatkar Hecê Hiso, ji gundê Çelebiyê herêma Kobaiyê, ji destpêka şêstiyan ve, derbasî nav tevgera Kurd dibe .Bi dil û can xebata xwe ya Kurdperwerî bedewam dike . Di nav gundiyan de, bi qedir û qîmet bû. Di 14/4/2006 an de, diç ser dilovaniya xwedê û bi beşdariya gundî, dost û hevalîn tevgera Kurdê di goristana gund e tê veşartin

www.arsivakurdi.org

*-**Li** 14.4an , Komela Ciwanên Kurd li Sûriyê , civata xwe ya fereh li dar dixe . Rapora salane ya li ser rewş û çalakiyên Komelê tê xwendin û rewşa Komelê ya tevane ji aliyê nûnerên herêman ve tê nirxwandin . Hêjayî gotinê ye , bê xuyan ku, nûnerek ji komîta rêzanî ya partiya Pêşverû ya Kurd li Sûriyê , ji ber Encûmena giştî ya Hevben Kurd ve , di gel gotinekê û piştgiriyê jî , lê beşdar dibe.

* - **Di** 21.4an de, Komela Ciwanên Kurd li Cindrêsê , bi boneya cejna rojnemevaniya Kurd , şahiyek bi alîkariya Koma Zanîn ya folklorî û Hunermend Sadêq Dilyar , şahiyek li nêzîkî gundê Miskê , li darxist . Şahî bi stiran reqis û çalakiyan zengîn bû.

* - **Li** 22.4an de jî, Komelê dîsa bi wê boneya jorîn , komcivînek li Helebê , bi beşdariya dora /25/ kesên ciwan, li darxist. Di komcivînê de, birêz Reşoyê pîrê , waneyek li ser rojnamegeriya bi zimanê Kurdî li Sûriyê, pêşkêşkir û beşdaran jî bi pirs û vepirsên xwe, komcivîn zengîn kirin .

*– **Bi** boneya cejna rojnamegeriya Kurd , li 21. 4. 2006an , rêxistina P.Y.D.Ks li bajarê Helebê seyranek geş û xweş , bi beşdariya dora( 3000.4000 )jin , mêr , pîr , kal, zarî, xort û keç ,li Efrînê , çiyayê Qêziqlî di nav darên merxê de li dar xist.

Şahiya seyranê di nav wê xwerista kesk û rengîn de, bi awaz û stiranên folklorî û evînî , çepikên gerim , reqis û dîlanên li hev dest pê bû . Paşê jî, Koma Nûhilat bi stiran, sema û çalakiyên xwe, ew şahiya zengîn kir. Dûvre Koma Kurdax bi şanoya xwe ya rexneyî pêşkêşkir û gotina P.Y.D.Ks jî ji aliyê endamê Komîta rêzanî Bavê Mesûd ve, ji beşdaran re, hate gotin .

Herweha bi xêr û xweşî şahî û seyran bi dawî bû . Û tevaya beşdaran jî , bi kêf ji wê seyranê vegeriyan mal

*- Avokatên Kurd li bajarê Helebê , cejna rojnemegeriya Kurd tînin bîra xwe , şahiyekê bi vê bûyneyê di 21an de, li hafa gola Meydanka delal , di xwaringeha Elteaxî de li dar dixînin . Û bi çepik , dîlan û stiran û xweşiyek bêhempa roja xwe derbas dikin û vedigerin mal.

*- Herdu partiyên bira Azadî di gel Yekîtî bi boneya cejna rojnemegeriya Kurdî , di 21an , seyranek bi haziriya dora 2000 kes , li Meydankê çêkirin. Şahiya seyranê bi alîkariya çalakiyên van Koman xweş bû, mîna Armanc, Raperîn , … hinên dî . Gotina partiya Azadî ji aliyê birêz Mistefa Cuma de, hate pêşkêşkirin . Û gotina xwendekar û avokatan jî hate xwendin . Bi vî awayî şahî bi serî bû .

*- Di piraniya Kilojeyên Zanîngeha Helebê de jî , xwendekarên Kurd , seyranên Buharê , di siruşta navça çiyayê Kurmênc de çêkirin . Bi van ton seyranan dilê xort û keçan xweş û geşkirin .

***- Divê em bi bîra xwendevanên Newrozê bînin ku , piraniya partiyên Kurd yên bira mîna Yekîtî ( ya dervayî Hevbend û Enî ) Pêşverû û Elpartî ya di Hevbendê de , seyranên rengareg di vê Buharê de, ji xelkê xwe re pêkanîn .***

www.arsivakurdi.org

# Heyva Avdarê, heyva şîn û şahiyê xatir xwest

## Kobaniyê:

*- Li 12 û 16 î heyvê, gelê me yê Kurd li gund û bajarê Kobaniyê, bi hezaran derketin şar û kastînan, pênc deqan bêdeng û bi awakî şaristanî û aştiyane rawestîn . Di wê seknandinê de, pakrawanên Kurd yên bûyera 12 î Avdara 2004an ya kambax ku, li herêmên Kurd, li Sûriyê serpêhatiye, di gel şehîdên Helepçe bi bîra xwe û gel anîn.

*- Li 21an jî , bi dehezaran gelê me yê Kurd li Kobaniya delal, di xwerista rengîn û xweşik de, li ber dengê awaz û stiranên folklorî û netewî û reqis û seman yên deşta Sirûcê, NEWROZA xwe xemilandin û bi kêf û şahî derbas kirin .

Digel nivîsandina gotina serokmarê Sûriyê bi xêzeke reş û qaling li ser şanogehê" Gelê Kurd pareke ji tevna civaka niştimanî ya Sûriyê ye".

## Reqê û Girêsipî :

*- Herweha li wir jî, di 12 û 16 an de, gelê me yê Kurd , şehîdên herdû bûyeran bi rengekî şaristanî di



wê seknandinê de, bi bîra xwe anîn . Û ew destên şoven û qirêj ku, bûne sersedema wê xwînrêtinê şermezar kirin .

*- Di 21an de jî, weke hemî cihên dî , bi hezaran derhatin çolê, bi çepik , dîlan, stiran û kêf û xweşî ew roja aştî , wekhevî û azadiyê derbaskirin . Hêja ye jî, em wînin zimên ku, dora şanogehê bi sirûda ( bijî biratiya Kurd û Ereban , bijî NWEROZ şana aştî û azadiyê û em tev de di vî welatî de hevpişk in ) hatibû pêçandin û ala Sûriyê bi ser de hatibû daleqandin . Ji bîr nebe jî, beşdariya hin kesan, ji hin hêzên Ereb yên dostê gel û doza Kurd li Sûriyê , di gel gotinên pîrozbahiyê yên wan ji gelê Kurd re pêşkêşkiribûn.

## Heleb :

Bajarê diwam di Sûriyê de, bajarê yekem ku bêtirîn Kurd lê dijîn .

*- Li 12 î Avdarê bi hezaran xelkê me yê Kurd li taxa Eşrefiyê , Çiyayê Seydo ( Şêx Meqsûd ) , Bistan Başa û li kastîna zanîngeha Helebê jî xwendekarên Kurd "5" deqan bêdeng man. Di bêdengiyê de , xwîna di wê rojê de hatiye rêtin bi bîranîn. Lê, li gel wê , di rûyê wan de, hertiştê bi azadî , aştî û wekheviyê ve girêdayî diyar dibû.

*- Li 16an jî , dîsa weke hersal û bi sêçar caran ji roja (12) an bêtir û li ciyên berê , gelê me yê Kurd li hev kombûn û (5 ) deqan sekinîn . Û bi bêdengî Helbçe bi bîra xwe tanîn , biratiya xwe ya netewî jî diyardikirin û digotin na şofînîzmê re, na ji quretî û nakokiya gelan re, na ji bindestiyê re, na ji qirkirinê re, na ji qedexekirina zimanan re û erê ji azadî , Aştî û wekheviya gelan re. Herweha meşek aştiyane ( bi qaserî 2000 ta 3000 kes ) ►►

li dar ket û bê ziyan bû. Lê mixabin li dawiyê dora 16 xortan hatin girtin .

* – Li 20an, şeva agirdadanê , meşa mûman ya ku, ji berî şeş- heft salan P.Y.D.Ks çêkirî , îsal jî Kurdên li Helebê rûdinin xwestin bi şêwakî aştiyane û şaristanî , bi mûm û şemedanan , gul û çîçekan û xemil û xêzan , çûk û mezin keç û xort, kal û pîr û bi mêr û jinan ve, meşekê li darxin, bêyî ku, tu ziyanê bighînin mal û milkên xelkê û xwestin bidin xuyakirin ku, gelê Kurd miletekî jîndar û şaristane û li gor demê ye. Lê mexabin û sed mixabin, çavsorî û şofenîzima destlata Sûriyê û sazûmana aşeyêsî nikarî bipejranda. Vêja berî ku, dest pêbibe , li kat 5,15 dora 4-5 hezar leşker, çendirme , aşeyês û hêzên beisî derbazî taxên Eşrefiyê û Şêx Meqsûd kirin . Bi çavsorî û awakî hovane û tewşankî li xelkê dan , av li wan reşandin , mûm ji dest wan gêrdikirin, sixêf ji wan re digotin û bi hemî kar û barên nebaş, kelkelên milet û bi taybetî xort û keçên Kurd zêde kirin . Herweha hêzên destlatê ji nebaşiya xwe neman ta hîştin ku, xort û keç xwe pêşandanek ne pîvayî li dijî wê quretiya wan derînin.

Xwe pêşandanek nema tê zeprandin .Li hember wê xwepêşandanê , dîsa hêzên destlatê ji ya xwe neman û herçûn çavsoriya wan zêdetir bû û dest bi bombeyên çavstêrkirinê , fîşek , lêdan , sixêf û girtinên tewşankî kirin . Weha dora 2 katan berdewamkir . Di encam de, gelek ziyanên kesayetî û tevane derketin hole, çi girtin , birîndarkirin , şewtandina makînan û şeknandina camên firoşgehan . Lê, ji bîr nebe kela şofenîzaman li 20an xuyaye nerjî, rabûn li 21an jî, li kat şeşê êvarê, li binî taxa Şêx Meqsûd , xelkê taxê ji sêrvîsan dîdinan, hin jê digirtin û hin jî nasnama wan jê dibirin . Lê mirov dikare bêje ku, di encamde , hejmara girtiyan ne kêmtirî 150î kesî ye , jê Ereb û Tirkman û yên kêmtirî 18salî jî hene . Emê wan kesên temenê wan kêmî 18 salan û komîta Sûrî ya mafên mirovan belavkirine û çûne dadgehê û hin ji wan hatine berdan bijmêrin :

1- Mihemed Goçer kurê Doxên
2- Henîf Hesen kurê Ehmed .
3- Cakî Şan Osman Xelîl .
4- Selah Mûred kurê Zûhêr .
5- Hesen Mihemed kurê Mihemed .
6- Mihemed Ronî kurê Bozên .
7- Xelîl Selûm kurê Mihemed .
8- Şiyar Bekir kurê Semîr
9- Elî Qoce kurê Selêh .
10- Ebdilqadir Mihemed kurê Şêxo .
11- Ehmed Beşîr kurê Ehmed .
12- Mihemed Emûnê .
13- Cemîl Xelîl kurê Şakrî .
14- Mihemed Silêman Ebdilfetah .
15- Mahêr Îbrahîm kurê Ehmed .
16- Şêro Melêk Neisan .
17- Hîşam Hesen .
18- Şadî Deqis .
19- Mihemed Mile kurê Umer .
20- Îbrahîm Îbrahîm kurê Şêxo .
21- Hesen Naiyê kurê Rustem .
22- Arêf Gasêm.
23- Îbrahîm Xelîl Elelî .
24- Aras Hebeş kurê Ezet .
25- Mihemed Dîb .
26- Ebdilqadêr Bistanî .
27- Nîdal Hazêm .
28- Xalêd Şêx Hemdo .
29- Ebdela Sebax .
30- Îbrahîm El-ebo .
31- Mistefa Silêman ./.

www.arsivakurdi.org

32- Mihemed Husên kurê Hemîd .
33- Mihemed Xalêd tewfîq .
34- Celal Mihemed Umer .
35- Seqir Elmihemed .

Lê gelekên dî jî hene mîna:

1- Avokat Serbest Şêx û Îsmaîl Zade.
2-Yosêf Yosêf kurê Welîd ( Qere depe , 18 sal).
3-Hesen Mihemed Hesen ( Kora , 18sal).
4-Wehîd Ebdilrehman Ibrahîm ( Çeqela ,
5-Nûrî Reşo Horîk ( Qre depe, 1988).
6-Azad Hebîb Mihemed ( Qurnê 35sal).
7-Şiyar Bekir Semîr ( 17sal).
8-Ibrahîm Horo Nûrî ( Bilêlko ).
9- Ehmed Yilmaz Cirnaz Ekrem ( Maratê).
10-Mistefa Exres Mistefa ( Maratê, 17sal).
11-Ebdihemît Ico Silêman ( Dargîr , 20 sal ).
12-Fexrî Ezîz Birîmo ( Me,imila ).
13-Ednan Şêxo Ehmed ( Kibêşîn).
14-Beşîr Reşîd Cefer ( Kotana).
15- Şiyar Hemzê Salêh ( Meydankê ).
16-Ehmed Bilko Ibrahîm ( Maseka ).
17-Selah Mûrad Mûse Zûhêr ( Kişte,ar ).
18-Ehmed Mihemed Oso ( Xalta ).
19- Mahêr Ehmed Ibrahîm ( Qota ).
20- Nîdal Isma,îl Xalêd ( Su,iriya).
21-Ehmed Birîm (Maseka).
22- Nîhad Reşîd Cemîl (Rehmaniyê).
23- Şêx Hibo Cemîl (Rehmaniyê).
24-Ehmed Qere Ehmed (Meydan Ekbez).
25-Bangîn Mihemed .
26- Egîd Hesen Ehmed .
27-Ebdiqadir Mihemed Ibrahîm.
28- Remzî Hec Hesen Mihemed (Sariya ).
29-Henîf Reşît Ehmed ( Sînka ).
30-Ibrahîm Elî Mihemed Mereskê).
31-Edhem Elî Hesen ( Keferdela jorin).
32-Ferhad Cume Cemal ( Barava).
33-Mihemed Îse Elî ( Barava).
34-Mihemed Kose Silêman Xelîl ( Şiyê.)
35-Ibrahîm Ibrahîm Mihemed ( Xelîlaka).
36-Aqîl Memo Elî ( Çobana).
37-Mihemed Kormisto (Raco).
38-Mehmûd Kormisto ( Reco).
39- Semîr Kormisto( Reco).
40-Hemîd Qicê ( Reco).
41- Sebrî Ehmed Şukrî ( Xirêbkê).
42- Semîr Mistefa ( Reco).
43- Ezîz Birîmo ( Memala ).
44-Henîf Ehmed Hesen ( Gundî Xelîl)
45- Ehmed Osman Elî ( Amka ).
46- Bilal Arêf Hebeş ( Gundî Hebo).
47- Cîger Cemîl Hesen ( Hec Hesna
48-Şukrî Yûsêf ( Rûta ).
49- Zîlas mislêm Hesen ( Qurtqilaqê ).
50- Şiyar Şêxo Selah ( Meydankê).
51-Mihemed Se,îd Yûsêf ( Etmana ).
52- Luqman Ehmed Şebab ( Qurqilaq).
53- Harûn Heyder ( Qurtqilaq ).

Em wek komîta rêvebir ya Newrozê û bi navê xwendevanên wê , ev karên qirêj ji aliyê destlatê ve pirotêsto û şermezar dikin , azadiyê ji girtiyan re û saxiya birîndaran dixwazin û hêvî dikin . Û ji gelê xwe hêvî dikin ku , di bûneyên dî de, bêtir şiyarbin û haj pêlan , nerindî û potirman hebin . Ji zirarê bi dûrkevin û li gorî şaristaniya demê bin .

./.

www.arsivakurdi.org

# Cejna Sersalê li Çiyayê Kurmênc

**Li** ba bawermendên ola Êzdî, Çarşema serê meha Nîsana Şerqî cejna Sersalê ye. Ew bi Çarşema Sor jî bi nav dibe. Wek dibêjin, di wê rojê de Tawisî Melek dadikeve erdê û li halê Êzdiyan dipirse. Pişt wê rojê her gundek bi serê xwe diçû ber pîrozga gundê xwe, qurban dikirin, xwarin çê dikirin û ahengên bi def û dîlan lidar dixistin.

Di van sî çel salên dawî de, şabûneka boneya cejna Sersalê hema hema vemirtibû, lê li van çend salên dawî, ji nû ve tê bibîr anîn û rêwresmên wê li dar dikevin.

Berê vê bi çend salan, hinek Êzdî dest pê kirin û her sala diçûn ber pîrozgeha Şêx Berkêt, ta li van du salên dawî bi sedan Kurdên Êzdî û ne Êzdî jî li ew boneya pîroz kom dibûn û şahî li dar dixistin.

Îsal, sala 2006 an, ji ber ku pozê çiyayê Şêx Berkêt bibû baregeheke leşkerî, şahiyên mezin li dora pîrozgehê hatin qedexekirin. Ji lewre jî şêniyê ku çûbû Sersalê li çend cihan belav bûn. Lê hejmara bilind li ber girê Endarê şahiyên xwe kirin û cejn pîroz kirin.

Bi gelemperî cejn û aheng cihê vehesiya hemî beşdaran bû, çi Êzdî û çi ne Êzdî, çinkî, ji bilî ku ew li Êzdiyan rojeke pîroz e, ew perçake ji dêrok û kelepûra gelê Kurd e jî. Em pir girîng dibînin ku were parastin û li dar xistin.

Em hemî Kurdan bi boneya cejna Sersala ola Êzdî pîroz dikin, û hêvîdar in ku sala tê ji ya çûyî xweştir be û armancên her kesên bindest pêk werin.

# Newroza Helebê

**li** bajarê Helebê , bi sedhezaran bi def û dîlan , reqis û seman çepik û lîliyan kêf û şadî û bi cilên rengîn , ji bajêr derketin û NEWROZa aştî , azadî û wekheviyê rengarengî kirin û pê şabûn, ji dost dijminan re diyarkirin ku, gelê Kurd û Newroz hertim li cî ye û tu hêz nikare wê ji rêça wê ya rast derîne . Ji bîr nebe jî gelek mîvanên **ragihandina şamê** jî bi kêf , xweşî û pîrozbahî lê beşdar bûn .Mîna 1-Şalyrê berê Ebdimecîd Mencûnê 2- Evokat Îbrahêm Melkî 3-Umer Qeşaş 4- Evokat Necîb Dedem û hinekdin.

**"komîta rêdekisyona weşana Newrozê bi bûneya cejna Newrozê, gelê xwe û gelên cîran pîroz dike û xêr xweşiyê ji tevan re dixwaze. "**

*****************************

*-**Li** 20an êvarî , cara yekem avokatên me yên Kurd dikarin rêdaneke fermî ji parêzvanê Helebê , ji bo lidarxistina şahiya Newrozê li Nadî Elirobe bistînin . Û di siya wê rêdenê de , bi beşdariya dor 400kes , (di nav de hin mîvanên Ereb ) û alîkariya tîpên folklorî ( mîna Zozan ) û hinde stiranbêjan, sersala Newrozê bi stiran , dîlan , çapik û reqis ta berdestê sibê borandin.

*-Rêxistina P.Y.D.Ks li bajarê Helebê li 20 û 21an 8500 kartên pîrozbahiyê yên xweşik û rengerengî li xelkê me belav kirin û bi wê awayî gelê xwe pîroz kir.

www.arsivakurdi.org

# Meha Adarê li Çiyayê Kurmênc

Gava Bihar tê, bi çiya û deştên me dikeve, darûber, hemî jîndar bi ber hulma wê dikevin, xwîn pê tên, geş û rengîn dibin. Mirov jî, ji bin setema Zivistanê serî radike, xwe davêje û singê xwe ji jiyaneke nû re vedike, bi agirê Newrozê, xwe ji qirêja dilan, nerindiya mirovan rizgar dike û bi hêviyeke mezin dadikeve meydana jiyanê.



Avdar meha Kurda ye! Li Adarê, hemî birînên me, bîranînên me yên ku li ser rûpelên wê bi neynûkan nikrandî ne, mîna ava kaniyan, zelal ji dilê me û ji kûraniya dîrokê de xwe hildidin. Ji ber ku di deher rojeke wê de yade û bîranînek me heye.

Avdar bi goçbarkirina Barzaniyê nemir dest pê dibe, bi Şêx Se'îdê kal bi dawî dibe. Di navbera wan de Envafal û Helebçe, Serhildan û Newroz, 12 Avdarê û gelek şahî û şînên me rûpelên xwe ji dost û neyaran û ji hemî mirovatiyê re vedikin.

Li roja 12 Avdarê li ser banga tevgera siyasî ya Kurd, bi hezaran şêniyê Kurd, mêr û jin, biçûk û mezin, li Çiyayê Kûrmênc li şar, şarûçik û gundan, li kat 11 nîvro, li kolanan û li ber rêkan pênc deqan bêdeng rêzgirtin û şehîdên berxwedana 12 Adarê li Qamîşlo li bîra xwe anîn. Li kat 11 nîvro, roja 16 mehê, dîsa bi hezaran mirovên Kurd, ji bo bîranîna Helebçeya Şehîd û 16 an li Heleb û Efrînê, dîsa pênc deqan rawestiytan û bi dilsozî û coşeke bilind bi bîra xwe anîn û bi soz û peyman ji hev belav bûn.

Li hêvara 20 mehê jî, roja weqfa cejna Newroza pîroz, cara yekê bû ku li şûn bazara Efrînê def û zurne lêketin, bi sedan jin û mêr, keç, xort û zarok li dora agirê Newroza xwe dîlan gerandin û xwe bi agirê wê vejandin. Çend zarokên biçûk, cilên fodil li xwe kiribûn, gul û mûmên vêketî di destê wan de bûn deketin nava dîlan û gelê xwe pîroz kirin.

Li ser çiyan jî, bi sedan agir hatin dadan û kurdax xemilandin. Li roja cejnê jî, bi deh hezaran mirov derketin sirûşta çiyayê Kurmênc a rengîn, li çiya û baniyan belav bûn, weke hersal, bi dilsozî û agahdariyeke balkêş, ahengên cejna xwe li dar xistin û li hev pîroz kirin.

Tiştê balkêş ew bû, ku berpirsyarên dewletê li Efrînê, îsal hinekî bi hişmendî rewş pîva bûn, wê hêşt ku milet bê asteng rêwresmên yadeyên xwe, li dar bixin. Belkî ji ber wê bû jî ku ji bilî çend qezayên trafîkê yên biçûk, tu teşqele û pirsgirêk nebûn û şahî û bîranîn bi aştî derbas bûn.

**Şehîdên me nemirdî ne**
**Herdem di dilê me de ne**
**Newroza me pîroz e**
**Şana azadiya me ye**

www.arsivakurd.org

# Newroza Şamê

**Peyamêrê Nerozê**

## Newroz li Şamê1956-1957



Newroz li Şamê, ji zû ve destpêkirî ye, berî hemî hermên kurdên Sûriyê, di sala 1956-1957an, komek ji zanayar û xwendekarên kurd li şamê Piraniya wan (ji kurdistana Iraqê bûn) Newroza xwe, li suruşta bajarê Zebedanî ( nêzîkî Şamê 60km) pîrozkirin, yên nas di nav wan de, Dr: Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrî Cemîl Paşa, Qedrî Can, Îsmet Şerîf Wanlî, Cemşîd Celadtet Bedirxan, Remo Hiso, Mihemed Zilfo, Umer Dezeyî, Ezedîn Mustefa Resol, Û Umer .....

## Newroz li Şamê

2618/2706K - 2006 Z



Îsal jî Kurdên li Şamê dijîn wek hersal ji sibehê zû ve, dest bi çûna hawîrdora Şamê kiribûn, bi taybetî, cihên ko komikên filiklorî li hebin, wek Rokindîn Feyhaa (**koma PYD**) , Hey Tişrin komik lê pirbûn wek **Erxewan**, **Azadî** her yek bi tena xwe, û koma **Azadî** , **Nûhilat**, **Zagros**, hersê bi hevre bûn û li Dîmasê koma **Hilat** û **Newroz**.

Di kat 70.30 an de, hersê komkên filiklorî Azadî, Nûhilat, Zagros dest bi meşa xwe kiribûn û ji Rukinldîn ta cihê Newrozê li Hey Tişrîn, bi hevre meşiyan û di katjimêr 10 û 10 deqan de dest bi ahengên xwe kiribûn.

Destpêkê hersê kom bi hevre derketin ser depa şanoyê , bi yek dengî sirûda niştmanî kurd Ay reqîb bi hevre strandin.

Koma yekê Azadî bû , ya didwan Nûhilat Û ya sisyan Zagros bû. Hersiyan di demên xwe de, pirograma xwe meşandin û dengbêjan stranên xwe stran û govendvanan govendên rengareng pêşkêş kirin, dilê keç û xortan pîr û kalan zarok û mendalan şa û geşkirin.

Newroz bi gelemperî xweş boriya, cilên filiklorî yên zarok û keçan, surişta buhara rengîn dixemilandin û geşdikirin, divê sala bê hemî keç û xortên me tevî zarokan, cilên xwe yên kurdî li xwekin/wergirn ta newroza me geştir û şêrîntir bikin.

Îsal cihê newrozê hinekî teng bû, milletê kurd bi coşekî mezin li newroza xwe xwedî derdikeve; ji ber avakirnên malên nuh cih newrozvanan û mêvanên wan yên Biyanî gelekî tengtirbû, lê wek kurd dibêjin ( cih ji dilan tenge) serjimara newrzvanan nayê jimartin lê bi10 hezaran bûn.

www.arsivakurdi.org

# 10 Nîsanê
# Cejna zarokên Kurdistanê

**Şêx birîmce Şam**

## 10ê Nîsanê



**di** 10 ê meha nîsanê de, paytexta Sûryê li Şamê, taxa Zorava, Koma **Nûhilat** ya filiklorî, cejna zarokên kurd pîroz kir, ji wan re şahîyek xweş li dar xist, tê de bêtirî 50 zarokên kurd beşdarbû bûn. Bi stran, kovend û , pirs û bersivan, bi xwerina şekiran û birina xelatan zorakan şeva xwe borandin. Bi Beşdarya hin helbestvan nivîskar û nûnerên kavar û rojnaman û bi xwendina hin gotar û perçe helbest şev hate xemilandin .Koma Nûhilat ya mezinan û şaxa zarokên Nûhilat çend govendên xweşik û çend stranên zarokan yên ji bo vê ahengê amadekiribûn, bi taybetî ji zarokan re pêşkêş bûn.

Hêjayî gotinê ye em bêjin ku helbest û awaz tev yên komê bûn û bi taybetî ji bo zarokan re bûn.

**Komela Ciwanên Kurd li sûryê (KCK)** jî alkarîyeke mizin, di vê ahengê de kiribûn , namak pîrozahî ji bo cejna zarokên kurd xwendin.

## 11ê Nîsanî



**di** 11 ê meha nîsanê de, giropa **Mosa Enter** ahengek ji bo zarokan li Şamê li taxa Rukineldîn, di eywaneke mezin de, bi alîkarîya partiya **rêkeftin** û bi beşdarbûn, jimarek mezin ji zarok û xwediyên wan û bi hebûna hin hunermendên nas wek: **Rêber Wehîd** yê ko sê stran bi kurdî û yek bi Erebî pêşkêşî zarokan kir û çend nivîskar û helbestvan û nûnerên kovar rojname û partiyan beşdarbûn , hin perçe helbest xwendin. Helbestvanekî Ereb jî di şevê de beşdarbû.

Bi hevkariya şaxê zarokên koma **Nûhilat**, yên ku du stranên zarokan pêkêşî zarokan kirin.

Pirograma ahengê xweş bû, rêvebirên şevê jêhatî û xurt bûn şeva zarokan baş borîya, zaro gelek şa bûn û pir keniyan û lîstin. Zarok tev hatin xelatkirin, eheng dora 3 ê katjimêran dirêj kir.

**Biryarek şoven:** Di 14/3 an deê xendekar Zekeriya Me'mo, ji herêma Kurdxêt, bi boneye sixêfên xwe bi destlatê kirine tê girtn. Piştê çend rojn, ji hemî dibistanên Sûriyê tê qetqndin .

www.arsivakurd.org

# Newroza Cizîrê

Îro Newroz e, cejna netewa kurd e. Her cih û deverên Cizîra rengîn, kirasê buharê yê ji rengê gul û sosinan hûnayî wergirtiye, bêhna nefel, endeko û kulîlkên rengereng hawîr belav dibe, dar ji nû ve dipişkuvin û kaniyên evînê der dibin.

Îro, helbestvan û nivîskar ji vê dîdar û sipehîtiya xwezaya bê mînak matmayî mane, ew nizanin çi bêjin û çi ne bêjin!!...Gelo ewê li ser sipehîtiya siruştê binivîsin yan li ser cil û kincên kurdî yên folklorî yên rnegane binivîsin, yan jî li ser tabloya herdiwan bi hev re!!..

Bi sed hezaran keç, law, zarok, pîr û kalên kurdan ji berbanga sibê ve malên xwe berdane û berê xwe dane cîgehên Newrozê, da ku rojeke xweş bi siruşta rengîn re bibûrînin, û cejna hev pîroz bikin.

Li Dêrika Hemko, Helêq, Tirbespiyê, Girê Sipî, Elî Fero, Çaxir bazar, Çol bustan,Girbawî, Serê kaniyê, Hesîçê..hwd, kurd, li dora komên xwe yên folklorî civiyan, li dîlanên wanî bedew temaşe dikirin, li stranên wan guhdarî dikirin, bi wan re stranên bav û kalan digotin û ji wan re bi dilgermî çepik dikutan..

Piştî bûrandina rojeke xweş, bi rojava re, xelkên me xatir ji hev xwestin û berê xwe dane malên xwe, bi hêviya ku Newroza bê xweştir û çaktir be.

Li dawiyê, em dixwazin sê têbînên giring ji keç û lawên gelê xwe re bibêjin, ew jî ev in:

**Peyamêrê Newrozê**

**1-** Wekî em hemî dizanin, Newroz sembola azdî, wekhevî û aştiyê ye, Newroz û pîrozkirina wê, ne dijî tu gel û netewan e, berevajî, em aramî û aştiyê ji xwe û ji hemî gelên cîhanê re dixwazin. Mixabin ku hin lawên me li hin deveran, dema di ber gundên Ereban re derbas dibûn, diqîriyan û tiliyên xwe bi ser wan de dihejandin!!!. Hêvî ew e ku em bi hiş bin û xwe winda nekin, em hewil bidin ku xeleka dost û alîgiran ji Ereb, Ermen û Siryanan ji doza gelê xwe ya dadmend re fireh bikin, gereke em wan di van cejn û festîvalan de beşdar bikin, têkiliyên dostanî û biratiyê di navbera xwe de xurtir bikin da ku ew ji doza gelê me re piştgir û yar bin!!. Hêvî ew e ku, di salên bên de, ev kiryar neyên dîtin, û naveroka newrozê weke cejna azadî, wekhevî û aştiyê bête parastin.

**2-** Hêvî û omîd ew e ku di Newroza bê de, li her cih û warî, komên me yên folklorî li ser yek sehneyê programên xwe pêşkêş bikin, ji ber ku gelê me ji yekîtiyê hez dike, ji hêleke din ve, divê em ji bîr nekin ku berî hertiştî em kurd in, paşê, em partîzan û alîgir in.

Em cejna gelê xwe li welêt û li derve pîroz dikin.

**3-** Em bi hêvî ne ku di her cejn û Newrozan de, gelê me bi kincên xwe yên folklorî cejnên xwe pîroz bike, ji ber ku ew cil û berg ji kevnetor û dîroka gelê me ye.

www.arsivakurdi.org

# Di bîranîna roja rojnamevaniya kurdî de Seyranek li gundê Elî Bedranê

**Di** bîranîna roja rojnamevaniya kurdî de û bi helkeftina derketina yekemîn rojnama kurdî ye, bi navê (KURDİSTAN) Ji aliyê bavê rojnama kurdî (MİQDAD MİDHET BEDİRXAN) li QAHÎRÊ di 1898 an de , di 21ê NÎSANÊ de Li gundê ( ELÎ BEDRANÊ) herêma Aliya , bi kenê gul û nêrgizan re ,koma (MÎDYA) ya folklora kurdî û bi beşdariya van komên folklorî (MÎTAN- HELEBÇE- AMÛDE- RONAHÎ- HÊVÎ- YEKÎTÎ- RONAHİYA ALİYAN). Cemawerê kurd ji gund û bajarên xwe, bi sira bayê rojava re li baskê ewrên sipî - wek dilê qîz û xortên kurda – siwarbûn û berê xwe dane gundê (ŞAHA REMO),her lat û gulek bi zimanê çûk û bilbila digot: Hun bi xêr, serseran û heru çavan hatin!!!

***Bi dehan mêvanê fistîfalê berê xwe dane bin konê mêvanan û dihatin pêşwazîkirin, ji wan :***

1-Mumtaz Elhesen (avokat)
2-Hewas Mehmûd (nivîskar)
3-Nidal Derwîş (endamê komîta mafên mirovan li SÛRYA)
4-Ebdilhekîm Umer (dîrokvan)
5-Bavê Derbas (welatperwer)
6-Malbata Ilyasê Remo bavê Heval
7-Şêx Murşid Elxiznewî
8-Azad Ehmed Elî (nivîskar)
9-Ebdilılah Başa (nivîskar)
10-Nisrîn (çîroknivîs)
11- Ednan Ebû Hêco (hunermend)
12-Ednan Beşîr (nivîskar)
13-Mihemed Qasim (berpirsê girûpa Dêrikê ya çanda kurdî)
14-Bessam Elte,ean (çîrok nivîs)
15- Xalid Cemîl ( rexnevan)
16- Ehmed İsmayil(nivîskar)
17-Evîn Şikakî (helbestvan)
18-Mesûd Eko (rojnamevan)
19-Ehmed Eko (nivîskar)
20-Rêwî (helbestvan)
21-Hêminê mîdî (helbestvan)
22-İbrahîm Elyûsif (nivîskar uendamê komîta mafê mirovê kurd li Sûryê)
23-Mihemed Ebdo Ebdo (helbestvan gurûpa Dêrikê) Û jimarek ji kesayetiyên civakî li devera Aliya û Dêrikê beşdarî festîvalê bûn.

***Hin birûsk hatibûn rêkirin ji aliyê:***

1-bavê Sabir (endamê komîta siyasî ya partiya yekîtiya dîmoqrat)
2-Şêrgo Ebbas (serokê kongirê kurdî li WAŞİNTONÊ).
3- Hevgirtina rewşenbîrên kurd li derve.
4-Komîta mafên mirovên kurd li Sûryê
5-Gurûpa çanda kurdî li Dêrika Hemko.

**Nûnerê weşana (NWEROZ) ev dîtin bi mêvanên fistîfalê re kirin :**

**Nidal Derwîş**: *(Ez dibînim ku rojnama kurdî weke tê xwstin bi rola xwe ranebûye, ji ber hin sedeman, wek nepeydabûna azadiyên giştî, dîmokrasî û mafên mirovan. Ya dîtir bi rojnamevaniya kurdî ve girêdayî ye , Ku* **D.R( 14)**

www.arsivakurdi.org

## Dumahêk: Bîranîna .....

berê xwe nedaye xwendevanên Ereb, lê ji kurda bi tenê re derketiye, ew pirtir pêdiviyê xwendevanên Ereb e. Rojnama Erebî jî bi rola xwe derbarî pirsgirêka kurdî nerabû ye .)

***Şêx Murşid Elxiznewî**: (*Ez bi navê xwe û bi navê malbata xwe sipasiya vexwstina we dikim, ji ber ku rola Rojnamevaniyê di xebata miletan de gelek pêwîste. Lê hîn ya kurdî, ne li gor bûyeran e. Gerek guhdariyê li Yekîtiya kurd bikin, di vir de, rijîman zimanê kurdî qedexe kirine ji ber wilo çanda me bûye bi zimanê Erebî, di fêrbûna zimanê kurdî de em xwe şagirtî dibînin, gerek tuştê li mero buhurtî be, mirov lê vegere û şaşiyê serast bike.*)*

***Bessam Elte,éan*** **:(**sipas, ez xêr û xweşiyê ji we re dixwazim,ez dibînim ku kêmasiyên rojnamevaniya Erebî gelek hene, wê ji bilî xwe pêve, guh nedaye tu kesî, ta nivîskarên wê jî, tu dibê qey ew parsê li ber dergehê rojnamevaniyê dikin. Ez di rojnameyên kurdî de amademe binivîsim. Berî nih, min beşdarî di rojnamekê de li Erbîlê dikir ,dawî her sal rojnama kurdî û miletê we yê leheng di xweşiyê de be.

***Evîn Şikakî**:* (Di pêşî de, pîrozbahî ji nivîkaran hemiyan re ,ez bi hêvî me ya Erebî jî em bixwînin,kovarên me ji berê pirtir in, ji ber kurdistana Iraqê arîkarî daye me ,em dixwazin hêz tev bibin yek, û arîkarî bi pîrekê re bibe da ku pêşkeve.)

***Hêminê Mindanî**:* (Ciwantirîn silav ji rojnamên kurdî re, û ji malbata Bedirxaniyan re, ji ber ew li ba min bavê çanda Kurdî ne, ez paşeroja kurda wek çirîskek ronahî di nêv ewrekî tarî de û weke tîrêjek geş ez pê dil xweş im . Rewşa çandê, bi rewşa gelê me ve girêdayî ye, ez bi hêvî me yek û yek dengiya tevgera kurdî wek diyarî em bidin gelê xwe.)

***Xalidê Cemîl** :* (Ev rojeke şahî ye, nemaze hevdîtina rewşenbîran ji hev re di vê rojê de, rojnamevanî bi rolek mezin derbarê mafên kurd û kurdistanê rabûye. Lê reşwşek xweştir jê re pêwîste çiku bi gelemperî ew di asteke kêm de ye, ji ber pispor di vî warî de ne hatine peydakirin, ew bi çakbîniyek xweş û hêja û hêviyek mezin lê dinerim û kêmasiyên wê nabînin.)

**Mihemed Qasim**: *(-pêşî pîrozbahiyê li gelê kurd dikim, li her deverên kurdistanê. Hem sipasiya her kesê ku bizav di ber fistîvala rojnamegiriya kurdî kiriye, çi bi folkilor û huner, çi bi raman û lêkolîn û bi amadebûnê jî dikim,…bi hêvî me ku her gavê werin bihtir li pêş bin.ji aliyekî din ve, tête xwestin ji rojnamevanê kurd, ku karekî zor bike heta bighe avakirina kesayetîyeke azad û serbixwe.*

*- pêwîste ku rojname serbixwe be, ji alî partiyan ve bête ragir û pişgirtin, wekî ew kar di xizmeta millet de ye. heger di vê rewşê de bmîne , bê guman, wê bibe rojnameyek rotînî, weke her welatê şûndemayî, û her rojnameya rûtînî bê sûd û mifa ye .- riya pêşketinê xuya ye: Hevkarî, hevpeyvîn, zanistî, dem buha bibînê, bi rêz li millet binêre û peywndiya bi her lextê millet ve girêde.. Ev jî, hinek mêranî jê re gerek e….!!* **D.R (15)**

www.arsivakurdi.org

## Dumahîk: Roja jina.....

Ev ton bawerî û pêdariya wê , bi doz û netewa kurd dikir ku , ew bi jîrekî di nava partî de çalakiyên balkêş bike . Vêca jî , ew ji hêla rijûma bêbexit û dîkitetor ya **Bexdê** ve berçav dibe .

Piştî lihevhatina destgîrên Îraq û Îranê, li gora peymana di -6- Avdarê ,sala -1975an de, li ceza'îrê di nava herdu karbidestên xwînvexwer de hatiye girêdan , şoreşa kurdistana Îraqê têkçû !.

Wisan jî , Leyla leheng û sê hevrên wê, têne girtin û wan davêjin binê hebis û zîndana Ebo xirêb,di -13- î-5- an sala -1975- an hatin darvekirin û bi serbilindî , ew di nava karwanên cangoriyan de cîheyekî bêlikirî girtin . Hêjayî gotinê ye ku, **Leyla** nemir , di sala -1951-an de, li bajarê xanqînê , ji dayîka xwe bûye û ew weke xwendekareke sala çaran ji beşî sosyolociyê bû.

**Beşdarên hêja û delal !**

Bê gûman **Leyla Qasêm** , bi şahinazî ji gelê kurd re , nemaze ji jina kud re îro bûye sambûla pêdarî û serxwebûnê . Lewre jî , em ji hêla xwe ve, weke rêxistineka jina kurd ya parta Yekîtî , li bajarê Helebê ,roja -13- gulanê , roja darvekirina **Leyla** û sê hevalan ve pêşniyar dikin ku, bibe roja jina kurd li sûriyê û daxwez û merema me ew e ku , tevgera kurdî li Sûriyê xwedî li vê rojê derkeve û her sal di vê rojê de, çalakiyên taybet li ser rewşa jina kurd werine li dar xistin , ta ku em jin û mêr bi hevdu re karibin heyameke xweş - tundurist avabikin , civaka kurd bajone ser tiştine îjdil û dûrketin ji hevzîvirandin û hilpekirina di çîh de.

* - Rêz û silav li giyanê pakrewana gelê kurd **Leyla Hesen Qasêm** .

*- Silav li giynê nemirên -12ê Avdarê û hemû nemirên gelê kurd li çar peçên Kurdistan .

*- zor -zor sipas ji baş guhdariya we tevan re .

***************************

**Dumahêk:Bîranîna.....** *Ibrahîm El yûsif:* (Piştî 108 salan ji derçûna yekemîn rojnama kurdî, tê xuyakirin ku wan di wê demê de zanîbû, rojname tiştekî giring û pêwist e, ew jî ne kêmî tivingê ye. Her dem û gav karên mezin li benda rewşenbîran e. Weke mînak, di bûyerên 12 ê Avdarê de, rewşenbîrên kurd karîbûn dengê gelê xwe bighînin raya giştî ya cîhanê. Lê, mixabin, rijêma Sûriyê gelek ji wan girtin û zindan kirin.)

***Azad Ehmed Elî:*** ( Bi derçûna yekemîn rojnameya kurdî, dîroka çanda kurdî nû dest pê kiriye, ew jî li cem kurdan mêraniyeke mezin e, rojname di ber mafê gelê kurd de serî hilda ye, Di nerîna min de, pêwistî bi derçûna rojname û kovarên serbixwe heye, da ku ji bin siha partiyan derkeve, ji ber pirengî ji civaka me re pêwist e; Dawî, silavên germ ji weşana Newroz re.)

**Ednan Beşîr***: ( Rojnamevaniya kurdî berî damezirandina tevgera siyasî bi 50 salî ronahî dîtiye, mûm li pêş gelê me pêxistiye, raman û hestên wî zengîn kiriye. Rojnama kurdî negihiştiye asta rojnama cîhanê, lê ew pêş ve diçe.)*

www.arsivakurdi.org

# Roja jina Kurd

Ev babet , ji rêxistna jinan yên P.Y.D.S, li Helebê , ji roja 13 Gulanê , roja bîrhanîn û salvegera dilêra gelê Kurd , **Leyla Qasim Hesen** amede bûye û li pêş girseyek jinan li Helebê pêşkêş dibe.

**Dîlan Zivingî**

**- Hevalên hêja, dost û hogirên delal !**

**-Win tev bi xêr li ser seran û herdu çavan hatine** .

Roja -13- gulanê , pêdarî û dilsoziya jina kurd nîşn dide ku , çiqas girîng e mirov ji bo dozike rewa û dadimend, mîna doza gelê kurd ku ,ev miletê me yê ji bo bidesxistina mafên me kurdan weke her miletên azad û serbixwe , ji sedên salan ve xwe daye ser riya kar û xebatê . Ma kî nizane ku gelê kurd , di dîrok û şaristaniya mirovan de xwedî rol û dewran bû , ji emperetoriya **mîdiyan** ve bigire ra di dewileta dostikiyan re derkeve , wê bêgûman ev rastiya me li jor bi navkirî bi zelalî û aşkere di rûpelên dîrokê de xwe destnîşan dide ! . L belê , berjewendiyên nemirovane hêştin ku , di peymana **Seykis -pîko** de, li sala 1916an de, welatê me Kurdistan û di nav çar dewletên bêbexit Tirkiyê , Îraq , Îran û Sûriyê de hate dapeşkirin , sînorên tund û dijwar xistin navbera me kurdan û destên bav , bira , dayîk û xwîşkan ji hevdu dikirin .Vêca jî , ji wa rojê ve û ta roja me ya îro, gelê me yê kurd , mîna kesên biyanî , li ser xaka bav û kalan û di bin nîrên zor û setemên hovîtiya neyaran de , li ber xwe dide .

Ev yeka hanê, ji tevan ve diyar e ku, Kurdên me ji hemû mafên mirovane bê par in , li encama vê ton zorê setemê ; gelê kurd ji zû ve, li dîrok û zimanê xwe xwedî derdikeve , bi serkêşiya kesên xwedî bi rûmet ew pakrewan û nemirên mîna mile **Mistefa Berzanî** , **Şêx Se'îd pîranî** , **Seyd Riza** , **Qadî Mihemed** û h.w.d pir şoreş , tevger , serhildan , dezigeh , komele û h. w d avakirine. Zimanzanên mezin mîna C.Bedir-Xan, Q.Kurdo û Reşîdê Kurd bi holê ketin, zimanê Kurdî bûye xwedî pirtûk, kovar û rojname...

**Xwîşk û birayên hêja !**

Bêguman , rol û paya jina kurd , di serpêhatî û bûyerên reş de , tim û tim bêtir e. Ji ber ku , wê her dem bav , bira , mêr , zarî didan û bi xwe jî bûye qurban . Lê zor mixabin , rol û keda wê , di fergûna dawî de cih digirt, an jî bin cil û di tariyê de dima . Gelo , kî nizane ku , bi dehan navên jinên xwedî bîr û bawerî , ji bo doz û rûmeta netewa kurd , ew bi serbilindî bûne qurban , nimûne û mînak jî di vê warî de gelek in , nemaze dema navê **Leyla** li guhên mirov dikeve, wa hîngê tavidanê navê dilêra kurd ya nemir **Leyle Hesen Qasêm** , bi bîra mirov tê !. Ew keça xwendekar ku wê , tu carî êş û lêdana miletê xwe ji bîra nedikir û tiştên pûç û vala weke keçike kurd li ser xwe nedipejirand , herdem li nik xoritên kurd di astenk û serpêhatiyan de amede û alîkar bû . Wisan jî , wê di nêv refên parta demiqurasa kurdistanê de , bi serkêşiya nemir mile **Mistefa Berzanî** weke endameke çav bi çîk kar û xebat dikir , **D.R(15)**

www.arsivakurd.org

H.d , hesta giştî li bal van hemerengên rêbaz û siyasetan ew bû ku em vêkre bê rewa ya zindankirînê ji bal desthilatekî Otoqratî ê bê bext ve riswa bikin , û hevbendîyek xûrt di nav me de hebû li hember çi tawankari yên derheqa çi berekî ji me di hate kirin .

**2- Çi bîranînên we yên balkêş di zindanê de hene ku cihên xwe kûr di hiş û giyanê we de girtine û nayên ji bîrkirin?**

Bûyerên balkêş ku ji bo hevalan re tên tûmar kirin ew helwestên mêrane ku pêk tanîn. Li destpêka girtinê em di sêlulên ku bi drêjayîa (180) s.m û firehî (90)s.m a bûn , bi dirêjaîya salek û sê mehan, ji bilî sê betaniyên kevn û qirêj li cem her yek ji me tune bû, heya meha çile ya diduwa me ji bilî çekên havînî tunebûn, rehmetiyê Kin'an û Deham û Xalid ên ku ji nava xwe digazinîn ketin astengiyên tendurustiyên sext de , Xwarina me : rojek savara tisî û mast bû û roja dî petatên kelandî û mast bû , tenê roja înê, birinc û tirşikek ku deh giram goştê bêlla tê de hebû, piştî du sal û heşt mehan em veguhestin zindan a Kelaê.

Li seretayî, mafê hepsî yên siyasî ên ku hepsiyên berî me jê sûd digirtin ji bo me jî pêk dihatin, lê piştî demekî, bêtir ji sed û pêncî peyamî gihîştin min ji bal rêxistinên cîhanî, Emnisty Internasîonal û komelên Mafên Mirov , rêcîmekî nû bi sextî li me û hepsiyên din hate aloz kirin, û tû mafên hepsiyên siyasî ne ji me re û ne ji yên berî me re berdewam kirin. Piştî salekê me veguhestin, her yek çû hepsa herêma xwe û di ancam de em çend heval hatin hepsa Hisîça ya nawendî û dîsan ew rêjîma Kelaê derbarê me de hate meşandin, ji bo hevdîtinên me û malbat û xizmanên me re , belgname ya Parastin ê pêwîst bû, û peyvê me bi malbata me re gereke bi zarê Erebî be, êdî min daxuyan kir ku ez êdî malbata xwe pêşwazî nakim an jî emê bi zarê Kurdî bipeyvin, Piştî şeş mehan rêveberê hepsê min agihdar kir kû hevdîtinên min û mirovên min azad e bi çi zarî be.

**3- Piştî van guhertinên mezin di hemî warên jiyanê de li cîhanê, hûn paşeroja gelê kurd bi tevayî û ya gelê me yê kurd li Sûriyê, bi taybetî çawa dixwînin?**

Guhertinên li cîhanê pêk hatine, pêwîste ku em wan sercem ne nerxînin bi yek şêweyî û ne bi yek radeyî. Îro roj Emerîka wekî serkirdeyekî cîhanê; bizav dike kû pêwendiyên wî û çalakiyên wî di her welatî û bi her rêjîmî re cuda bin ji wan çalakiyên ku, di welat û bi rêjîmên din re bi cih tîne, wek nimûne ; helwestên wan li hember Îraq û Lîbiya, û li hember Kûriya û Îran de.

Îro Emerîka piştgirê Kurdê Îraqê ye, ji sedema ku Kurdê Îraqê piştgirê wan bûn dema cenga azadkirina Iraqê ; Lê Emerîka ji bo berjewendiyên xwe, pêve dajot ku çend armancên Turka li Iraqê pêk bîne , lê ew helwêstên xurt ku miletê kurd pêk anîn, nemaze helwestên kak Mesûd ê Barzanî wergirt ne hiştin kû tu berjewendiyên Turka pêk bên. Li ser vê bingeha han pêwîste em istiratîgiya tevgera miletê kurd ava

D.R(18)

www.arsivakurdi.org

bikin, pêwîstê em istiratîciya xwe li ser şiyanên xwe yê taybet ava bikin, û du re piştgiriya Emerîka yan a Yekîtiya Ewrupa bixin nav factorên şiyan û hêzên xwe.

Lê mixabin îro em dibînin ku hindek siyastvan, hindek rêkxistin bi bîrûbawerên ku Emerîka û Peymana Nato amade ne ji bo destên xwe bidin pişta miletê Kurd li Sûriya , ev baweriya han di gel baweriyek kûr ; ku rêjîma Sûriya li ber herfandinê ye û ev herdu bawerî bûne bingeh ji bo çalakiyên û siyaseta wan ê giştî û ez bawerim ku çewtiya vî ramanî ron û aşkira ye .

**4- Hûn rewşa tevgera kurdî li Sûriyê çawa dinirxînin?. Çi kar û xebat li bal partiya we ve ji bo yekirina gotina wî dibe?**

Ji dema ku ev guhertinên li cîhanê peyda bune, bi rastî, guhertinek xurt di rewşa tevgera kurdî de jî peyda bûye, nemaze ji roja 12 Avdarê bi mebesta yekkirna helwêst û gotar û çalakiyên tevgerê , û em dişên bêjin kû ew bûyera hovane çavên berpirsiyara vekir ser rasteqinekî giring kû ne tenê siyaseta kurdan li Sûriyê qedexe ye. Lê belê hebûna kurdan li Sûriyê ne bi xweşê disthilatê Ye , di encam de rêkxistinan bi tevayî xwe dan dor hev û çalakiyên hevbeş hatine rûdan û em dişên bêjin kû ev peymana di nav- bera Ber û Hevbendî yê de , û hevbendiya digel bizavên dîmokratiyên Ereb di Daxwyaniya Dimeşq ê de ew jî ji sedema wê bûyer a navdar bû. Di vê çarçewa han de, em dikarin bêjin ku ((Partî pişikdariyek baş kir)) .

**5- Enî û Hevbendiya kurdî di danezana Şamê de cih girtine, hin gazin têne kirin ku, di belgenameya wê ya bingehîn de, mafên gelê kurd bi xurtî cih ne girtine. Di vî warî de, hûn çi dibêjin?.**

Dema me çend mafên rewa ji Kurda re di belgenamê de çespandin , me di wî sînorî de danî ji bo hêzên Erebî pesend bikin û bibin di nav erkên van hêzan, ev di gumana min u hevalên Hevbendî û Berê de tê nirxandin wek serketinek bilind û xurt, lewra ev mafên han , ew bi tenê ne ku di programên rêkxistinên me de hatine nîşan kirin. Bê guman e mafên kurdan, di serxwebûnê de mafekî rewa ye, lê, ku doza wî mafî bike pêwîste ku çek û rextên xwe amade bike û dû re dozê bike, û ne rajê rim a ku ji dar çêbûyî rengê Don-Kîşot.

**6- Îro, Enî û hevbendiya kurd karên hevbeş bi hev re dikin, ev yeka han cihê dilxweşî û pîroziya gelê me ye. Gelo hun di Enî û Hevbendiyê de hewil didin ku encumeneke kurdî li Sûriyê bê avakirin, hemî hêz û rêxistinên kurdî û kesayetiyên xweser cihên xwe têde bigrin?.**

Birastî, damezrandina encumenek bo sercem kurdên Sûriya daxwaziyek giring û hêja ye xebatê, lê ji bo kû ev encumen xwedan sûd û mifa be, pêwîst e ku endamên wî yên xweser hilbijartî bin ji nav kesayetiyên ne alîgirê tu partiya bin. Û divê ku nûnerîtiya sercem, komele, sindika, eşîr û nûnerên sercem çalakiyên civakî, kultûrî û hunerî têde amadekirî bin, û mercê diwemîn ji bo serketina vê projê aşkirahî ye, û biryarên wî bên rêz girtin wek yasayên rewa ku ji bal desthilatekî ve tên der .

**D.R.(19)**

www.arsivakurdi.org

Eger encumena tê xwestin bi vê şêweyî be, Partî amade ye ku bi hemî hêz û şiyanên xwe ve xebat bike di rêgeha damezrandina vî encumenî de.

**7- Di warê Geşkirina wêje, çand, folklor û zimanê kurdî de, partiya we îro çi karî dike?**

Di warê Folklor de, Partî jimarek ji koman damizrandiye, komên Partî xwedan astekî hunerî bilind in ta radiyekî baş.

di warê fêrkirina zimanê Kurdî de , çend bizavên kêmtir ji viyana me hatine pêk anîn, lê di warê wêje û çanda Kurdî de, mixabin . Ku ji bili arîkariyên diwarê çapkirin û firoştina berhemên nivîskaran tu bizavên dî tune ne, û em hêvîdar in ku em vê kêmasiyê di demekî kurt de çareser bikin.

**8- Eve 66 hejmar in ji weşana Newroz a du mehane bi temenê 10 salan belav bûne. Hun derçûna vê belavokê çawa dibînin, çi rexne û kêmaniyan lê digrin mamoste?.**

Biborin dema qusurekî we aşkira bikim , hevalên hêja, ku ez bêjim ev hejmara 66 an ku cenabên we bo min perû kir , hejmara yekemîne ku dighe min, û ez omîdewarim ku ne ya dawî be, her hal ez dikarim bêjim : destên we xweş bin, asta weşana we bilind e.

**9- bêgomane ku zimanê me, nasnama me ya netewî ye. Ji bo fêrbûn û fêrkirina zimanê dayika me, hûn ji keç û lawên gelê xwe re çi dibêjin?.**

Ev pirsa han bersiva xwe di nava xwe de hilgirtiye, eger ziman nasnama netewekî be, pêwîste ew netew bibe xerîkê zimanê xwe, hemî hêz û şiyanên xwe ji bo rêncberiya wî re terxan bike, û em ji keç û lawên gelê xwe re dibêjin : gelî xoşewîstan, zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin da cîhan bizanê kû miletek ser rûê zemînê heye, navê wî Kurd e.

## Çalakiyên Herêma Cezîrê

*** -**Bi boneya salvegra rojanamegeriya kurdî , komîta çandî ya rêxistna herêma rojavayî qamişlo, bi çalakên gewre rabû. Çar sêmînerên çandî , li dar xistin .

**1-** Di **6/4** an de, Dr Farûq Ebas , şevbuhêrka me ronî kir. Mijar li ser dîroka gelê herêmê ji 2900-2550 berî zayînê û xalin girîng têde rawestiya .

**2-** Di **13 / 4** an de, sîmînera duyemîn mamoste Azad Alî nivîskar , lêkolînvan û berpirsê kovara EL-hîwar. Wî li ser kurd û îslamiya konevanî , bi nêrînekê li ser rewşa kurdî ya awarte û sedemên ev rewş çêkirine û xwest têkiliya di navbera îslam û rewşa konevanî ya kurd di dîrokê de dest pê kir .

**3-** Sêmînara seyemîn **20 / 4** mamoste Îbrahîm alyûsif , helbest û rojnamevan, li gel mamoste Hewas Mehmûd , nîvîskar û lêkolînvan e. Wan bi hevdu re sêmînar , li dar xistin . Mamoste Hewas , li ser ragihandina kurdî dest pê kir. Di pê re mamoste Îbrahîm fêrdana xwe, li ser ragihandina Sûrî û rewşa wê şrovekir

**4-** Sêmînara dawî **27 / 4** mamoste Konê reş mêvanê wê bû, bîna kurdistana azad jê dihat , ji ber ku nû ji seredana wê hatibû . Şevbuhêrkê li ser rojên dawî , yê mîr celadet bû , danerê (A- B )ê ya kurdî latînî bû .

Mixabin ev sêmînar tev, di cejna ronamegeriya kurdî de bi zimanê Arabî bû , ji bilî ya mamoste Kon bi zimanê me yê şêrîn kurdî bû .

## Cejna çarşema Sor û rojnamevanên kurd pîroz be

www.arsivakurdi.org

# Hevpeyvîn bi mamoste Mihemed Nezîr Mustafa re Sekreterê Partiya demokrat a kurd li Sûriyê (Alpartî)




**Mamoste, weşana Newroz dilxweş û şa ye ku, di vê hevdîtiê de li we guhdariyê bike . Raman, hizr û bîrbaweriyên we derheqa derd û êşên gelê me yê kurd biguhêze xwendevan , gelekî bi xêr û xweşî hatî....**

**1- Ji me hemiyan re nase ku we dora 10 salan ji temenê xwe, ji bo kurdayetiyê di zindanên Sûriyê de bûrandine. Li destpêkê, hêvîdar in hûn li ser girtina xwe û hevalên xwe biaxivin. Gelo sedemên wê girtinê çi bûn, çend kes û kî bûn, têkilî di zindanê de bi we re çawa bûn?**

Piştî pêşkêşkirina rêz û hurmetên xwe ji weşana Newroz re, û sipasiyên germ bo we berêzan li hember berxudanawe bal hevdîtina kesayetiyên kurd , ez lêborîn ji cenabên we dixwazim û dibêjim ew salên ku min di zindanê de qedandî ye heşt in ne deh sal in.

Wekî hûn dizanin, girtin û zindan kirina çi kesên Kurd li Sûriyê , tu pêwistî bo rewa kirina wê tune , lê sedema ku desthilatê dabû rû, ew helwesta Partî ya ku li hember projeya ((Hîzam EL Erebî)) wergirtibû, piştî kû dan û sitandinên me di gel desthilatê re bê encamên erênî bi domahî hatin. Tê bîra min Partî çend corê daxwyaniyan der anî, yek ji wan ji bo raya giştî ya Navnetewî û Erebî, yek ji bo Kongira Serokên Ereb, yek ji bo Camia Erebî û yek ji bo Kurdên herêma Cizîrê ji bo agehdar bin, û tu arîkarî di warê cêbicêkirina vê projeyê terxan nekin , û li dijî wê rawestin.

Hevalên zindankirî ji endamên Partî : Dehamê Mîro (Sekretêr) – Kinanê Egîd (P.B) – Emînê Şêx Abdê (K.N) – Mihemedê Fexrî - Xalidê Meşayix – Ebdullaê Mela Elî - û ez (P.B) bûn, di roja yakemînê tebaxê de destgîrbûn , û piştî du mehan dû kesayetiyên xweser gihîştin me, yek bi navê (Ehmedê Erebo) û ê din (Hesenê Mûsa) bûn , di sala 1975 de hevalê rehmetî (Hemîdê Sîno) hat destgîrkirin. Di zindanê de me têkilî bi core û corên zindankirî yên siyasî ên ereb dikir ,

Be'sî ên hevalên Saddam ,Be'sî ên hevalên Cidîd , Iraqîyên hevalê Saddam , Bizava Azadîxwazên Islami , Birayên Musulman **D.R (17)**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org